

Koçberên Herema Gifhorn'ê

Vexwendname ya ji bo Civîna Koçberan li Niedersachsen'ê.

Dem:Şemî, 02.07.2011, seet 12.00 heya 17.00

Navnîşan: Kargah e.V., Zur Bettfedernfabrik 1, 30451 Hannover-Linden

Silav û rêz mêvanên delal û koçberên hêja,

em koçberên herema Gifhorn'ê bi kesên ku piştgiriyê didin me, em hewl didin ku civînekê li dar bixin, ku em karibin we hemû koçberan bîne cem hev û em bi hev re hemû kesên din vexwînin civîna me ya ku ewê di 25.07.2011 li Hannover'ê pêk were, bikin. Di civîna têkîliyê de emê di serî de hevdû nas bikin û emê li pirsgrêkên hev guhdar bikin, pirsgrêkên li her herema û cîhan de û herwiha tecrûbeyên meyî bi Protestan re biaxivin.

Herema Gifhorn û şaredariya wê ev gelek salin hewl dide ku hemû niştecihên herema xwe bi hev re di nava hewayek wekhev û xweş ku hemû mirov karibe bi hev re bijî. Lê belê hayima li Meinersen rewşa wê cûda ye. Hayima li Meinersen'ê û herwiha hemû hayimên li eyalata Niedersachsen'ê wisa hatiye avakirin ku têkîliya mirova bi civakê re qut bibe, herwiha odeyên û cîhê jiyanê gelekî tenge û mirov nikare li wira jiyanekê prîvat bijî.

Gelek ji me pera nastîne, tenê „Wertgutscheine“ distîne. Qedexeya kar û herwiha rewşa xirab ya tenduristî û tibê jî di rojana me deye. Ausländeramta Gifhorn (Dayra Biyanîyan ya Gifhorn'ê) bi awayekî xirab zextan li ser me dimeşîne. Ev jî wisa ye, em her 3 roja carekê ji bo dirêjkirina Duldung (mafê runiştinê) em neçar in ku 15 km haylo biçin aliyê Gifhorn'ê ji bo ku dirêj bikin. Xebatkarekî dayra biyanîyan herdem me tehdît dikin ku ewê me bişînin welatê me an jî ewê heqê me kêmbike.

Derketin û dûrketina ji hayimê gelekî zahmete ji ber ku dayra biyanîyan qedexe daniye ser me, ji bo ku haya raya giştî û ji bo ku em nikaribin bi herem û mirovên derdora xwe re têkîliyê dênin. Shambu Lama, hevalemê me ku li hayimê dijî, ji aliyê dayra biyanîyan herdem dihata tecrûdkirin û astengkirin. Xebatkarekî dayra biyanîyan ji wî re got, ku ewê di nava 2 rojan de wî vegeşîne welatê wî û zarokê wî yê elman jî heye. Ji bo wê jî Shambu Lama xwe avêt bin tirênekê û xwe întihar kir. Wî ew zext û zorên ku em hemû koçberên li Niedersachsenê pêre rû bi rû nin, nikarîbû rakira û xwe întihar kir.

Li hayima Bramsche-Hesepê li dijî van bûyerên bi vî rengî helwest hate nîşandan. Hat xwestin ku bi berpirsyarê hayimê re axaftin were kirin, ji bo çareserkirina pirsgrêkan. Ev daxwaz pêk nehat, ji bo wê jî di 24.02.2011 çalakiyek protestoyî pêk hat, herwiha di 14.03.2011 de dîsa çalakiyek protestoyî pêk hat.

Li wê derê pirsgrêkên ku heye û ku niştecihên hayimê şikayet dikin evin: 1. Ji şûna pera „Gutscheina“ didin wan. 2. Nanê qantînê, yanî ji bo kesên din nanê cûda nîne, ku yek ji aliyê tenduristî nikaribe wan xwarinan bixu, ewê wê rojê birçî bimîne. 3. Bijîjkên wê derê nexweşan naşîne bijîjkên pispor û heger bişînin jî bi awayekî derengî dişînin. 4. Stres û zextên dayra biyanîyan û xebatkarekî ango personelê hayimê.

Bajar ango şaredariya Oldenburg pîlan dikir, ku hayimê di bin navê Komînê de veguherîne xaniyekî jiyanê hevbeş. Li dijî vê pîlanê gelek çalakiyên protestoyî pêk hat, ya dawî di 26.02.2011 de pêk hat. Piştî wê meclîsa bajar biryar da ku wê hayimê bigre. 300 koçber diviyabû ku li bajarê Oldenburg'ê were belav kirin, û yê mayî jî ewê li eyalata Niedersachsen'ê bihata

belavkirin. Lê belê pîlanek heye ku dixwazin li bajarê Oldenburg'ê hayimekê avabikin. Hîna ne diyare bê ewê ew koçber rewşa wan çawa bin, yê ku niha li ZAAB (Zentrale Aufnahme- und Ausländerbehörde = Navenda Cîhê wergirtina biyaniyan û dayreya biyaniyan) disekin.

Wezîrê karê hundir yê eyaleta Niedersachsen'ê Uwe Schünemann siyasetek nijadperestî û qirêj li himberî biyanî û koçberan dimeşîne. Schünemann hîna jî îdaa dike, ku dayreyên biyaniyan li Niedersachsen'ê rast dixebitin. Ew ji aliyê Însyatîfa „Jugendliche ohne Grenzen = Ciwanên bê sînor“ ve cara duyan wek wezîrê ku mirovan diqewirîne hate hilbijartin. Ji bo wê em bang dikin ku hemû kes li himberî vê nijadperestiyê derkeve, li himber Duldung'ê derkeve, li himber dayreyên biyaniyan ku bi nijadperestî nêzîkî biyaniyan dibin.

Were em hevdû di civîna ku ewê di 25.06.2011 de ji seet 12:00 heya 17:00 de ewê li Hannoverê pêk were, de bibînin. Heqê rê ya we emê bidin we. Ku ji bo we destûr ji aliyê dayreya biyaniyan pêwîst be, ji kerema xwere bi mere têkeve têkiliyê û emê ji bo we bibin alîkar. Dema we xwe ji bo civînê qeyd kirin, ji kerema xwere bîne ziman bê hun kîjan zimanî diaxivin û dizanin. Ji ber ku emê hewl bidin ku di civînê de zimanekî hevbeş bi kar bîne.

Ji kerema xwere di demek kurt me di derheqê hatina xwe de agahdar bikin.

Silavên germ.

Koçberên Herema Gifhorn'ê û herwiha kesên ku piştgiriya didinê.

Têkîf:

Nurjana (rûsî û elmanî)

Tel.: 01748633075

E-Mail: asylbewerbergifhorn@yahoo.de

Karawane Wuppertal (kurdî)

Tel: 01578 65 46 336

Flüchtlingsrat Nds.

Langer Garten 23B, 31137 Hildesheim

Tel.: 05121/15 60 5

Emaîl: sw@nds-fluerat.org